Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165




# Bi berhemên destên Nîgar mirov diçe demên berê



**Nîgar Abdullah hewl dide bi riya berhemên destan çanda Kurdî zindî bihêle û biparêze.**

Nîgar Abdullah a ji Silêmanî nêzî 10 salan e karên nexşandina çente, kum, kolye yên bi motîfa Kurdî, kar dike. Nîgar Abdullah a di heman demê de parastina çanda Kurdî dike li ser xebata xwe dibêje: "Her jina ku bixwaze karekî bike divê astengiyan nas neke û di karê xwe de bi serkeftî be."

**'Min bi karê xwe çanda Kurdî zindî kir'**

Nîgar Abdullah da zanîn ku niha jiyan zehmet bûye û pêwîstiya jinan bi aboriyek serbixwe heye jin dikarin di hemû karan de serkeftî bin û wiha got: "Di nava van çend salên dawî de çanda Kurdî ber bi tunebûnê ve diçe. Ji ber wê jî fikirîm ku girîngî bidim çanda xwe û min biryar da vî karî bikim. Ez bi karê xwe hem çanda Kurdî zindî dikim hem jî guherînên nû çêdikim. Min karê nexşandinê hilbijartiye, ji ber ku ji berê ve gelek hatiye bikaranîn û ku nêzî 30 şêwazan dihatin çêkirin."

**'Bila jin kar bikin'**

Nîgar Abdullah destnîşan kir ku berhemên destên wê ji aliyê gel ve gelek tên ecibandin û wiha got: "Karê min rastî eleqeyê tê. Dema ku beşdarî pêşangeh û festîvalan dibim xelk ji min re dibêje te demên kevin anî bîra me. Jin gelek destrengîn in û di karên xwe de serkeftî ne. Ez weke jinekê peyama min ji bo jinan ew e ku kêrhatiya wan heye û di malê de ne bila kar bikin û bi vî awayî jî xelk rêzê li karê me re digre, ji ber ku ger em guh bidin gotinên xelkê em ê nikaribin tiştekî bikin."

**'Bi riya online karê xwe pêşkêş dikim'**

Nîgar Abdullah di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Min li mal dest bi karê xwe kir û bi riya medyaya dîjîtal xelk karê min dibîne û daxwaz dikin. Ji ber ez nikarim firoşgehê vekim ji ber kiriya wê zêde ye. Ev jî ji min re giran e û wisa li min dike ku karê xwe bi nirxek zêde bifiroşim. Ji ber wê di festîval û pêşangehan de ez karê xwe pêşkêş dikim. Ew cih gelek caran kirêyek zêde dixwazin. Ji ber wê nikarim di wê demê de jî bi rêjeyek baş berhemên karê destê xwe bifiroşim. Ji ber wê beşek ji jinan nayên û wisa lê tên ku ji karê xwe sar bibin."

# Enerjiya insan û xwezayê

**Jonathan Hateley peykerên fîgûratîf çêdike û ew van peykerên xwe li meydan û parkan datîne. Erê ew peykerên fîgûratîf çêdike, lê di heman wextî de xweşikiyeke lîrîk jî li wan zêde dike. Fîgûrên wî axelebe insan in û peykerên wî jî ji bronz in. Ew tevgerên insanan bi motîfên xwezayê re dike yek û bi vî awayî peykerên henûn û xweşik disêwirîne.**



Hateley beriya van peykeran çêke ji televizyonan re xebitiye. Wî ji bo filman efekt û model sêwirandine. Her wiha wî ji bo operayan jî dekorên sehneyan çêkirine. Lê piştî salên 2003'yan meyla wî bêhtir çûye ser peykeran. Nexasim jî gava ku wî pirtûkeke li ser xwezayê xwendiye, fikrên wî yên li ser peyker û xwezayê bêhtir wî teşwîqî vî karî kirine.

Hateley dibêje, "Di wê pirtûkê de dihat gotin, insan û xweza yanî her tişt ji heman madeyê hatine çêkirin. Yanî bi heman enerjiyê ava bûne. Ji lewre min jî xwest xwezayê bi figûrên xwe şirove bikim û têkiliya me ya bi xwezayê re nîşan bidim. Ew enerjiya ku ji bedana fîgûrên min difûre û weke kulîlkekê tê xuyanê, îşaret bi enerjiyê dike."

Sudoku: Bersiv 81


| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 7 | 8 | 3 | 9 | 5 | 2 | 4 | 1 |
| 1 | 4 | 2 | 6 | 8 | 7 | 9 | 3 | 5 |
| 5 | 3 | 9 | 1 | 2 | 4 | 6 | 7 | 8 |
| 4 | 5 | 7 | 9 | 1 | 8 | 3 | 2 | 6 |
| 8 | 9 | 3 | 2 | 5 | 6 | 4 | 1 | 7 |
| 2 | 6 | 1 | 7 | 4 | 3 | 8 | 5 | 9 |
| 7 | 8 | 5 | 4 | 3 | 9 | 1 | 6 | 2 |
| 9 | 2 | 4 | 5 | 6 | 1 | 7 | 8 | 3 |
| 3 | 1 | 6 | 8 | 7 | 2 | 5 | 9 | 4 |

Sudoku:Pirs 82

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | | 7 | 3 | | 1 | | | |
| | | | 9 | | | | | 8 |
| 2 | | 8 | | | | | | |
| 1 | 8 | | 2 | | 9 | 4 | | |
| 5 | 3 | | | | | | 9 | 2 |
| | | 9 | 1 | | 5 | | 8 | 6 |
| | | | | | | 9 | | 5 |
| 3 | | | | | 2 | | | |
| | | | 5 | | 7 | 8 | | 4 |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Astronomî (Fransî) | **(Zanist) Stêrnasî, zanista stêran, lêkolînên zanistî li ser stêran li asîman** |
| Astronot (Fransî) | Kesê/a bi kêştiyên esmanî li valagehê digere. Kozmonot, ezmanger |
| Astronman (Fransî) | Ezmannas |
| Dîplomasî (Fransî) | 1.Peymanên têkiliyên navneteweyî saz dikin. 2.Li welatekî biyanî û civînên navneteweyî de karê yan jî hunera nûnertiya welatê xwe. 3. Erk û pîşeyê kesê di vî karî de dixebite. 4.Şandeya ji van kesan pêk tê. |
| Dîplomat (Fransî) | 1.Kesê bi siyaseta derve re mijûl dibe û ji bo welatê xwe hatî erkdarkirin. |
| Emperyalîzm (Fransî) | Siyaseta ku bi darê zorê welatê xwe dike serdestê welatên din. Mêtinkarî |
| Emperyalîst (Fransî) | Hêza ku xwediya fikra emperyalîzmê ye |
| Misyon (Fransî) | 1.Erk. 2.Armanc. 3.Saziya erkekî dînî, zanistî yan jî dîplomatîk girtî ser milê xwe ya ji çend kesan. |
| Misyoner (Fransî) | Kesê bi belavkirina dînekî, bi taybetî Xiristiyaniyê hatî erkdarkirin |
| Propaganda (Îtalî) | Xebata ji bo danasîn, ecibandin û belavkirina fikrekê yan baweriyekê bi gotin, nivîs yan rêbazên cuda |




## 'Bi Cezayên Disiplînê Nikarin Gelê Azadîxwaz Bêdeng Bikin'

Bi pêngava "Jin jiyan azadî ser bixe azadî" Yekîtiya Jinên Ciwan yên Efrîn û Şehbayê ji bo têkbirina tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan li qadan çalakiyan li dar dixin, jinên ciwan diyar kirin ku heta azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan misoger nebe, wê çalakiyên wan dewam bikin.**R-2**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1072 11-Hezîran- 2023 www.ronahi.net/ku/

# POLÎTÎKAYÊN BÊHIŞKIRINÊ LINGEKÎ ŞERÊ LI DIJÎ KURDAN E

Dewletên dagirker li Kurdistanê polîtîkayên înkar û îmhayê li hemberî civakê didin meşandin. Ji bo bêhişkirina civakê, madeyên hişbir wek amûrekê bikar tînin. Bi taybetî dewleta Tirk a dagirker vê yekê bi rêya saziyên sivîl, komele û weqfan dike.**R-6**




## Guhartina Demografîk li Efrînê berdewam e



Kiryarên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê yên dijmirovî li Efrîn bênavber didom in. 5 salin ku dagirkerî bi tevahiya şêwazan guhartina demografîk li Efrînê dimeşîn e. Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan ya Efrîn, ji destpêka dagirkirina Efrînê ve, zêdetirî 25 kampên mîtîngeriyê hatine avakirin.**R-5**

## Navenda Mihemed Şêxo afrênera çand û hunerê ye




Hevserokê Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Huner ê ya bajarê Qamişlo Ehmed Hemo diyar kir ku navenda Mihemed Şêxo di Şoreşa Rojava de gelek serkeftin bi dest xistiye û bûye afrênera Çand û hunera resen. **R-7**




**Kujerên bi hezaran kurdan çi bê şermin**
Hafiz Ahmet *R-6*

## Mexmûr sembola berxwedanê ye



Rêwitiya wan ya ber bi Başûrê Kurdistanê ve, ne ji bo serî tewandinê bû. Ew li pey doza rewa ya gelê Kurd bûn, dema koçkirin dizanîn ku ewê ber bi rêwîtiyek dûr û dirêj biçin, 30 salin penaberên Mexmûrê, li hemberî zilm, zordarî, êriş, birçîbûn, tênbûn, germahî, toz û xiyanetê di nava berxwedanê dene. Ew êdî bûne sembola berxwedana Gelê Kurd. Berxwedana 16 rojî, bû ispata berxwedana 30 salan ya penaberên Mexmûrê.**R-4**

## 'Tifaqa bi Kurdan re wê serweriya xaka Sûriyê biparêz e'



Hiqûqnas û şîrovekarê siyasî Hisên Naso anî ziman ku piştî hilbijartinên Tirkiyeyê dê çavnebariyên dewleta Tirk li Sûriyeyê zêdetir bibin. Naso bang li hikumeta Şamê kir ku ji bo rêgirtina li ber planên dewleta Tirk û rizgarkirina herêmên dagirkirî tifaqê bi Kurdan re bike.**R-3**


# ‘Bi Cezayên Disiplînê Nikarin Gelê Azadîxwaz Bêdeng Bikin’

Bi pêngava “Jin jiyan azadî ser bixe azadî” Yekîtiya Jinên Ciwan yên Efrîn û Şehbayê ji bo têkbirina tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan li qadan çalakiyan li dar dixin, jinên ciwan diyar kirin ku heta azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan misoger nebe, wê çalakiyên wan dewam bikin.

**Esma Efrîn/ Şehba**

Di girtîgeha Îmraliyê de tecrîdeke giran li ser Rêber Abdullah Ocalan tê meşandin, ji 25 mehan ve, tu rêxistinên





navnetewî, parêzer û malbata Rêber Ocalan derbasî Îmraliyê nebûne û tu agahî jê nehatine girtin. Dewleta Tirk a faşîst careke din cezayê disiplênê li ser ferz kirine. Li hemberî tecrîda giran ya li ser Rêber Apo, tavahî gelê Kurd û gelên azadîxwaz çalakiyan cur be cur didin meşandin.

Têkildarî tecrîda giran ya li ser Rêber Abdullah Ocalan, pêngava’Jin Jiyan Azadî Ser Bixe Azadî ‘ berdevka Yekîtiya Jinên Ciwan li herêma Şehbayê Cûdî Mistefa û endama Yekîtiya jinên Êzîdî Ahîn Elî ji rojnameya me re axivîn.

**`Armanca sereke têkbirina tecrîdê ye`**

Cûdî Mistefa di destpêka axaftina xwe de tecrîda Li ser Rêber Apo bi tundî şermezar kir û girêdayî hemleya hatiye destpêkirin wiha got: “Yekîtiye Jinên Ciwan li ser asta bakur û rojhilatê Suriyê pêngava “Jin Jiyan Azadî Ser Bixe Azadî” destpê kiriye, di çarçûveya vê hemleyê de xebatên berfireh tên meşandin. Armanca sereke ya pêngavê, di serî de ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan e, her wiha ji bo azadiya tavahî jinên cîhanê yên ku di bin zordestiyê de jiyan dikin, ev pêngav hat destpêkirin. Tecrîda ku li ser Rêber Ocalan di girava Îmraliyê de tê meşandin ji derveyî exlaqê mirovî ye. Li dijî şikandina vê yekê em ê, bi rihê tolhildanê di xeta yekemîn de têdikoşin bikin.”

**‘Tecrîda girankirî didome’**

Cûdî diyar kir ku tecrîd ji kesayet bêtir li ser hişmendiyê ye, lewra cezayên disiplînê tên dirêjkirin û wiha domand: “Hêzên navnetewî yên kompiloger ji bo bêbandorkirina fikirê Rêbertî yê ji bo azadiya tavahî gelên Rojhiolata Navîn û cîhanê, kompilo destpêkirin. Hêzên serdestî cîhanê naxwazin gelên Rojhiolata Navîn bi rengekî azad bijîn. Li ser vî esasî ev 24 salin ku tavahî zagonên navnetewî yên girtiyên siyasî di derheqê Rêbertî de hatine binpêkirin û ew ji hemû mafên xwe yên hiqûqî bê par maye. Ji 25 mehan ve tu agahiyên fermî û zelal di derbarê rewşa Rêber Ocalan de nayên girtin. Rêxistina CPT jî bê rol û misyon maye, her wiha li gor berjewendiyên hêzên gilobal kar dike. Bi vê yekê careke din bi binpêkirina mafên girtiyekî siyasî faşîzma Tirkiyê cezayê disiplînê 6 meh din jî dirêj kir.”

**‘Bi cezayên disiplînê nikarin gel bê deng bikin’**

Ahîn Elî jî, anî ziman ku cezayê disiplînê ji bo bêdengkirina çalakiyên gel û parêzerên Rêber Apo ye û wiha got: “Dewleta Tirk a faşîst bi awayekî tûnd tavahî cezayên dijmirovî û nehiqûqî li ser Rêber Ocalan ferz dike. Her wiha tevahiya zagon û pîvanên mafên mirovan binpê dike. Ev cezaya disiplînê ya ku hatiye dirêjkirin tenê ji bo rawestandi-



na serlêdanên parêzerên Rêber Apo ye, her wiha raewstandina çalakiyên gel yên ji bo azadiya fîzîkî ya Rêbertî ye.”

**`Li hemberî faşîzmê soza tolhildanê`**

Ahîn di axaftina xwe de tekez kir ku heyanî ev tecrîd neyê şikandin ew ê têkoşînê berdewam bikin û axaftina xwee wiha bi dawî kir: “Ji bo têkbirina tecrîdê û azadiya fîzîkî ya Rêber Ocalan em hemû berpirisyarin, li dijî faşîzmê me soza tolhilandê da ye. Li ser wî esasî em bang tavahî gelê azadîxwaz li cîhanê dikin ku asta çalakiyên ji bo azadiya Rêber Apo bilindtir bikin û bibin agirê şewtandina faşîzma Tirkiyê.”

# Bi azadiya jinê re civak tê avakirin

**Nehîr Pale**

Li herêma Minbic, Tebqa, Reqa û Dêra Zorê tecrubeya jin a xwe birêvebirin û ji pirsgirêkên jin re buyîna çareserî, mezintir dibe. Berhema têkoşîna jin êdî li van herêman hêdî-hêdî berhem dide.

Piştî şoreşa Sûriyeyê sala 2011`an jin ji hemû pêkhateyên Sûriyeyê heyanî astekî bilind bû parçeyek ji vê şoreşê. Li herêma Minbic, Tebqa, Reqa û Dêra Zorê jî ev tevger çêbû. Piştî sala 2013`an çeteyên DAIŞ`ê Reqayê û bajarên dîtir dagir kir, destê xwe xiste qirika jinê û her diçû nefes lê teng dikir. Dîmenên qirêj mîna recim, jinên Kurd ên Êzidî li bazaran firotin û hemû jinên ku li gorî çeteyên DAIŞ`ê zagon pêk ne anîne ceza kirin, li ber çavên jin bûn. Hemû jin êdî bi şev û roj di tayê de bûn, gelo wê rojekê wan bigrin, an recim bikin an jî bikujin?

**Kî ew ji vê yekê rizgar kirin?**

Sala 2016`an hemû hêzên leşkerî bi navê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ji herêma Minbicê li hemberî çeteyên DAIŞ`ê dest bi hemleyê kirin. Hemleyên rizgarkirina herêma Minbic, Tebqa, Reqa û Dêra Zorê ji çeteyên DAIŞ`ê heyanî sala 2019`an dewam kirin. Şervanên YPJ`ê parçeyek ji van hemleyan bûn û di eniyên pêş de bûn. Beşdarbûna şervanên jin ji hemleyan re ji bo jin bû hêzeke mezin û mîna ku çavên wan li rastiyê vebibe. Di têkoşîna jin a li van herêman de gelek jin mîna Henai El-Seqir, Hevrîn Xelef, Hebûn Ereb, Hind Xideyîr, Seida Hurmaz, Rûweyda El-Ebid, Nadiya Xeşan û hwd. Şehîd bûn.

**Jinê di her qadê de xwe birêxistin kir**

Piştî ku herêm dihatin rizgarkirin, Meclîsa xwe ya Jin ava dikirin, jin tevlî xebatan dibûn û hêdî-hêdî Mala Jin di çareserkirina pirsgirêkên jin de dibû xwedî rolekî mezin. Ew jina hatibû qeydkirin û fetisandin êdî nefes stand û ciyê xwe di nava xebatê de girt. Di aliyê civakî, perwerde, aborî, tendurustî û hwd berpirsyartî rakir. Li van herêman Akademiyên Jin vekirin û dest bi perwerdeya xwe kirin.

Sala 2021`an jin êdî rêxistinbûna xwe ferehtir kir û mekanîzmayên rêxistinî dan guhertin. Kongrê lidarxistin û di encama wê de nav hat guhertin û bû Kombûna Jinên Zenûbya. Navenda wê bajarê Reqayê ye. Li herêman Meclîsa Giştî ya jin û 11 komîte (Komîteya Têkiliyan, Dada Civakî, Malbata Şehîdan, Perwerde, Tendurûstî, Aborî, Çand û Huner, Parastin, Civakî, Raghandin û Arşîv û Darayî) hatin avakirin. Rêziknameya xwe li ser bingehê wekhevî di navbera jin û mêr de û hevjiyana azad amade kirin û xwe birêxistin kirin. Piştî du salan herêma Minbic, Tebqa, Reqa û Dêra Zor meha Gulanê û Hezîrana 2023`an konferansê xwe lidar xistin.

Konferans bi dirûşmeya: Bi têkoşîna jina rêxistinkirî, şoreşa xwe biparêzin û bighîjin azadiyê, hatin organîze kirin.

Di bernameya Konferansan de perspektîfên Rêber Abdullah Ocalan ku bal dikşandin ser rêgezên Tevgera Jin, hatin xwendin, rapora xebatên xwe yên du salan û rêzikname jî xwendin. Salonên konferansan bi wêneyên Rêber Abdullah Ocalan, alên li ser hatibûn nivîsandin: Jin, Jiyan, Azadî û wêneyên şehîdan hatibûn xemlandin. Herêm di konferansên xwe de xebatên xwe yên du salan nirxandin, pêşniyarên xwe pêşkêş kirin, berdevkên xwe ji nûve hilbijartin û Meclîsa xwe ya Giştî çalak kirin.

Piştî ku konferansên Kombuna Jinên Zenûbya yên herêman hatin lidarxistin, wê êdî berbi Kongreyê ve biçin. Kongraya Kombûna Jinên Zenûbya dê di mehên pêşde were lidarxistin.



# Navenda Mihemed Şêxo afrênera çand û hunerê ye

Hevserokê Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Huner ê ya bajarê Qamişlo Ehmed Hemo diyar kir ku navenda Mihemed Şêxo di Şoreşa Rojava de gelek serkeftin bi dest xistiye û bûye afrênera Çand û hunera resen.

**Norşîn Sîno /Qamişlo**

Huner yek ji girîngtirîn pêkhateyên şaristanî yên civakê ye, ji ber ku beşeke bingehîn a pêvajoya pêşketin û geşepêdana civakan e. Herwiha zimanekî taybet di xwe de dihewîne û dihêle ku mirov xwe îfade bike. Di heman demê de jî hebûna mirov ya ku dihêle ew bi derdorên xwe re têkiliyê deyne da ku çanda xwe bi civakên cihêreng re parve bike. Em çand û hunerê wek bîranîna hunerî bi dîroka xwe ya folklorî dibînin.



Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê jî ku li bajarê Qamişlo ye ,civaka hunerê afirand û bi taybet jî civaka kurdî . Beriya Şoreşa Rojava derfet ji bo kurdan tune bû ku fêrî huner û çanda xwe bibin. Lê piştî destpêkirina Şoreşê navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Huner gelek serkeftin bidestxist û bû jêdera çand û hunerê.

Derbarê kar û xebatên Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Huner ê , hevserokê navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê Ehmed Hemo ji rojnameya me “Ronahî “ re axivî .

Ehmed Hemo diyar kir ku rêjîma Sûrî astengiyên mezin ji bo wan derdixist holê û wiha axivî: “Despêkê me mala çandê li Qidûrbek ava kir, ji ber zordariya Rêjma Bass ya wê demê, tevahiya çalakiyên me bi awayekî feşartî pêk dihatin, herwiha heta xwendina pirtûkên bi zimanê kurdî jî qedexe bû.”

**‘ Ji bo pîroziya keda Mihemed Şêxo , me navend bi navê wî vekir’**

Ehmed hemo dazanîn ku wan , ji bo pîroziya keda hunermendê kurd Mihemed Şêxo, wan navend bi navê wî vekir û wiha axaftina xwe berdewam kir: “Sedema binavkirina navendê jî , ji bo pîroziya keda hunermendê nemir Mihemed Şêxo , di milê hunera kurdî dede bû. Mihemed Şêxo ji bp hunera kurdî gelek ked da, ji bo wê jî rastî gelek îşkenceyan ji aliyê rêjîme ve hat , em jî tu carî keda wî vala dernaxin û herdem wê didin ber çavên xwe, herwiha li ser eynî xetê kar dikin .”

**‘ Navenda Mihemed Şêxo di şoreşê de gelek serkeftin bi dest xistiye’**

Ehmed destnîşan kir ku ,navenda Mihemed Şêxo di warê hunerê de gelek serkeftin bi dest xistin e û wiha domand: “Tevî ku me koma Botan ava kiribû û em tevlî çalakiyên ku dihatin lidardixist dibûn , lê zehmetiyên me gelek hebûn .Niha em bi azadî kar dikin. Herwiha komên me gelek sekeftin bi dest xistine û bidestdixin . Ji komên, koma Botan e û koma Sakîne ya xweser e. Komên me yên şano ên zaroka û mezinan jî hene . Di heman demê de Komên navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê tevlî gelek festîvalan bû ne û serkeftinên berçav bidestxistine .Herwiha em li navendê jî festîval , pêşengeh û gelek çalakiyên derbarê çand û hunerê li dar dixin, wek feststîvala’ Yekta Herekol ya şano, Orkêş ya mûzîkê ‘ ,pêşengeha Rojava ya ji bo wênesaziyê û gelek çalakiyên hunerî lidar dixin , tê de endamên ji dervî Rojavayê Kurdistanê jî , li gorî derfetan bi coşeke mazin beşdar dibin.”

**‘Êrîş bandorekê neyênî li karê Çand û hunerê dike’**

Ehmed hemo di çarçoveya karê xwe de diyar kir ku ambargoya li ser Rojava û girtina deriyên sînorî dibe sedema derketina astengiyan li pêş karê wan û wiha got: “Ambargoya li ser Rojava û girtina deriyên sînorî bandoreke



neyinî li karê me dike, di festîval û pêşengehan de hunermend herwiha şanoger û wênesazên me dixwazin tevlî bibin ,lê ji ber girtina deriyên sînorî di hin caran de ew nikarin beşdar bibin. Herwiha êrîşên ser Rojava jî bandorê li xebatên çand û hunerê dike. Armanca me ya sereke ew e ku em Civaka Kurdan bi Cîhanê bidin nasîn .”

**‘Em dixwazin Çand û Hunerê geştir bikin’**

Hevserokê Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Huner ê Ehmed Hemo daxwaz kir ku çand û huner geştir bibe û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Bi çand û hunera xwe ya ku bingeha wê felsefeya Rêber Apo ye ,emê hewl bidin xwe bighênin hemû Cîhanê , herwiha xwesteka me jî ewe ku çand û hunera me geştir bibe.”

# Parastina amûrên kevneşopî mîraseke çandî ye

**Egîd Mehmûd/Qamişlo**

**Hin mirov ji bo parastina çandê, ji komkirina amûrên kevneşopî hes dikin. Yek ji wan kesan jî Fîxan Hîmo ye, ji sala 2004’an de dixwest ku amûrên kevin kom bike, Şoreşa Rojava bûye sedemek girîng ku daxawza xwe pêkbîne û muzexaneyeke biçûk ava bike.**

Çand nasnameya neteweyan nîşan dide, çand û kevneşopiyên civaka Kurd jî hişt ku çanda Kurdan heta roja me ya îro bê jiyîn. Li bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek mînakên heskirên amûrên kevneşop hene ku heya roja îro hatin, bi dilxweşiyek mezin alavên folklorî di malên xwe de dihewînin û bi kar tînin.



Fîxan Hîmo ku mamosteyê ziman û wêjeya Kurdî ye, ji gundê Hîmo yê girêdayî bajarê Qamişlo ye, di mala xwe de mûzexaneke biçûk çêkiriye û alavên folklorî diparêz e. Dema mirov derbasî mûzexaniya biçûk ya di mala Fîxan de dibe, ji xwe re kêliyek vedigere dewlemendiya çanda Kurd.

Fîxan Hîmo ev çend sal in van kevnareyên çandî li gel xwe dihewînê û di nêrîna wî de ew dema li van mîrateyên dîrokî mêze dike jiyana wê ya bi ked dilnizmî û heskirî di bîra wê de derbas dibe. Fîxan weke mafekî xwezayî erkeke pîroz li ser xwe dibîne ku van amûrên kevnar biparêze. Derbarê mûzexaniyê de û hiskirina çanda komkirina alav û amûrên kevnar yên kurdan, Fîxan Hîmo ji rojnameya me Ronahî re axivî.

Fîxan diyar kir ku wê di sala 2004an, ji bo danheva amûrên çanda kurdî, dixwest ku muzexaneyeke biçûk avabike, lê wê demê rêjîma Baas derfet nedida ku çanda kurdî were naskirin û pêşxistin.

Piştî sala 2011an ku kirîza Sûriyê û Şoreşa Rojava destpêkir, Fîxan dest bi pirojeya vekirina dibistanekê ji bo afiradina zimanê kurdî û muzexaneyke biçûk kir. Wî di hundirê wê muzexaneyê de amûrên girêdayî çanda kurdî komki, her wiha dixwst ku van amûrên kevnar bike wekî erşîfekê ji bo parastina çanda kurdî.

Li gorî Fîxan dîroka xaniyê wî yê ku kiriye muzexane, vedgere sala 1915’an, herwiha wî navê her amûrekî ku di muzxaniyê de û bikaranîna wê li cem xwe qeyd kiriye.

**Şêwazê danheva amûran û astengî**

Fîxan diyar dike ku ji bo komkirina amûran, wî kedeke mezin daye û gelek astengî kişandin e, ji ber ku gelek amûr dihatin firotin û buhayê wan pir dihate dixwestin, ji ber rewşa aborî jî wî nikarîbû nirxê wan bide, lê neçar ma ku wan amûran bikire da ku ev amûr wendanebin.

Fîxan destnîşan kir ku wî lêkolînên meydanî li gundan dikir û çi amûrên balkêş didîtin, derbasî gel wan malan dibû û ji wan dixwest ku radestî wî bikin. Li gorî fîxan wî hin amûr ji bakurê Kurdistanê jî dan hev bi rêya hin kesan aniye muzexanoiya xwe.

**Çand nasnameya gel e**

Fîxan Hîmo da xuyakirin ku tu kesî ji bo karê komkirina amûrên çandî piştgirî pê re nekirî ye. Herwiha



wî çend caran alîkarî xwestiye ji bo nûjenkirina muzexaneyê an jî firehkirina wê, da ku amûrên tê de bên parastin. Fîxan da zanîn ku amûrên ku wî komkirine çanda gelekî û nasnama netewekî pênase dike, lê mixabin tu kesî giringî neda karê wî. Fîxan pirs dike ku gelo çima heta niha ew negihiştin e wê asta ku çanda xwe biparêzin an nasbikin û wiha pê da çû û got: “Bila her kes nasbike eger ev amûr winda bibin wê çand jî winda bibe, heta dawiyê jî em ê vî karê pîroz dewam bikin û em daxwaz dikin ji saziyên girêdayî Rêveberiya Xweser ku alîkariya me bike. Armanca me ew e ku çanda kurdî li herçar perçeyên Kurdistanê were naskirin û parastin.

# Li Kurdistanê polîtîkayên bêhişkirinê

Dewletên dagirker li Kurdistanê polîtîkayên înkar û îmhayê didin meşandin. Ji bo bêhişkirina civakê, hişbirê wek amûrekê bikar tînin. Bi taybetî dewleta tirk a dagirker vê yekê bi rêya saziyên sivîl, komele û weqfan dike.

**Tirkiye û bakûrê Kurditanê**


Tirkiye yek ji wan dewletan e ku madeyên hişbir lê tê hilberandin, bikaranîn û bazirganiya wê tê kirin. Li gorî rapora sala 2022'yan a Desteya Kontrola Hişbirê ya Navneteweyî (INCB), Tirkiye di hilberîna madeya xam a afyonê ku morfîna wê zêde ye de, di rêza sêyemîn a cîhanê de cih digire (69 ton); di heman demê de welatê herî zêde madeya xam a afyonê lê hatiye depokirin a cihanê (303 ton) ye.

**Nvendên hilberîna hişbirê**

Li aliyê din, li gorî raporên Neteweyên Yekbûyî madeyên hişbir ên li Efganistan û Îranê tê hilberandin derbasî Ewropayê tên kirin, madeyên hişbir ên sentetîk ku li Ewropayê tên hilberandin jî derbasî Rojhilata Navîn tên kirin. Tirkiye jî bûye qada transferkirina madeyên li herdu aliyan û "navenda hişbirê". Li gorî rapora Ofîsa Madeyên Hişbir û Sûcan a Neteweyên Yekbûyî ya sala 2023'yan, li Tirkiyeyê mîqdara kokaîna ku hatiye desteserkirin di sala 2021'an de bi 7 qatan zêde bûye. Li Tirkiyeyê di sala 2021'an de 22,2 ton eroîn hatiye desteserkirin û ev mîqdar li gorî sala 2019'an ji sedî 79 zêde ye.

**Lingekî şerê li dijî kurdan**

Ji salên 1990'î ve ku têkoşîna azadiyê ya Kurdan bi pêş ket, dewleta Tirk li Kurdistanê hişbir wek alaveke şerê taybet li dijî gelê Kurd belav kir. Şebekeya hişbirê ya ku salên 90'î dewletê li Kurdistanê belav kir, bi hikumeta AKP'ê re sazkar bû. Li gorî hejmarên fermî yên di sala 2010'an de hatin parvekirin, hejmara weqf û komeleyên li Bakurê Kurdistanê hezar û 146 bû, lê di dema AKP'ê de ji sedî 200 zêde bû û derket 3 hezar 367'an. Di çaryeka yekem a sala 2010'an de ev hejmar derket 3 hezar û 688'an, di sala 2002'yan de hejmara weqfên li bajarên Bakûr 179 bû, lê di dema AKP'ê de tenê li 9 bajarên Bakurê Kurdistanê 188 weqfên din li van zêde bûn. Bi rêya komele û saziyan ciwanên Kurd û malbatên welatparêz dikin hedef û ji hişmendiya xwe ya welatparêzî û têkoşîna azadiyê dûr dixin.
Li gorî lêkolîna Navenda Lêkolînên Sosyo-Polîtîk ên Qadê ya li bakûrê Kurdistanê, di sala 2021'an de bikaranîna hişbirê ya li Bakûr di 6 salên dawîn de 2 qat zêdetir bûye. Li gorî lêkolînê, di nava civakê de ji sedî 22-23 bikaranîna hişbirê heye. Heta di rapora Saziya Statîstîkan a Tirkiyeyê de ku saziya fermî ya dewletê ye de jî, tê diyarkirin ku tenê di navbera salên 2016-2017'an de li Şirnexê bikaranîna hişbirê bi 4 qatan zêde bûye.
Li gorî rapora 2021'an a Navenda Madeyên Hişbir û Tiryakîtiyê (Miptela) ya Ewropayê, di salek dawî de li Tirkiyeyê 17,4 milyon kesên di navbera 15 û 34 saliyê de madeyên hişbir bi kar tînin. Li gorî




rapora sala 2019'an a Neteweyên Yekbûyî, rêjeya mirinên di bin 30 saliyê de ku ji ber dozên zêde yên hişbirê çêdibin li Tirkiyeyê zêde û di rêza yekemîn a cîhanê de ye.

**Iraq û Başûrê Kurdistanê**

Bi zêdebûna êrişên dagirkeriyê yên dewleta tirk re li Başûrê Kurdistan û Iraqê bazirganiya hişbirê û bikaranîna wê berbelav bûye. Li gorî raporên hikumeta Iraqê, bikaranîna hişbirê beriya sala 2003'yan kêmtir bû. Dewleta tirk bi êrişên xwe re derfet ji bazirganên hişbirê yên li ser sînor re peyda dikir û bi rêya torên hişbirê hewl da li herêmê serwer bibe. Li gorî çavkaniyên fermî yên Iraqê, bikaranîna hişbirê li Başûre Kurdistanê beriya salên 1990'î di asteke gelekî kêm de bû, lê piştî sala 1991'ê bi êrişên dewleta tirk re bikaranîna hişbirê û bazirganiya li herêmê zêde bû. Di raporan de hat ragihandin ku Başûrê Kurdistanê bûye herêmeke derbasbûna madeyên hişbir.
Li gorî lêkolînan, li Başûrê Kurdistanê û Iraqê ku bazirganiya madeyên hişbirê û bikaranîna wê zêde bûye, tiryakîbûna madeyên hişbirê zêde bûye. Tenê li gorî daneyên fermî yên sala 2021'an li herêmê 481 kîlo hişbir û nêzî 2 milyon hebên captagon hatine desteserkirin. Li Başûr jî eroîn, esrar, captagon û krîstal madeyên hişbir ên berbelav in. Raporeke 23'yê Mijdara 2016'an a pisporên Iraqê diyar dike ku tesîsên hilberandina metamfetamîna krîstal li Iraqê hene.
Her wiha qaçaxçîtiya madeyên hişbir bi rêya bajarê Enbar ê li ser sînorê Sûriyeyê tê kirin. Tenê îsal (2023) zêdetirî 3 milyon hebên hişbir ku di nava sêvan de veşartî bûn, li Deriyê Sînor ê El Qaîm ê Dêrazorê û herêma çolistana Enbarê ya li rojavayê Iraqê ji aliyê hêzên ewlehiya hikumeta Iraqê ve hatin desteserkirin. Tenê di sala 2022'yan de nêzî 6 ton madeyên hişbir li herêmê hatin şewitandin û îmhakirin. Li gorî hejmarên fermî di navbera salên 2019-2022'yan de zêdetirî 43 hezar kes bi sûcdariya hişbirê hatine girtin.
Tê diyarkirin ku li Başûrê Kurdistanê bi hevkariya Tirkiye û hikûmeta herêmê veguhastina navneteweyî ya ku bazirganiya hişbirê lê tê kirin û bikaranîna wê ya di civakê de jî zêde dibe. Li gorî hin lêkolînên fermî li Başûrê Kurdistanê, bi taybetî li Dihok û Hewlêrê nêzî 4 hezar şîrketên dewleta tirk hene. Dewleta tirk a dagirker mîna ku li Bakur kir, bi hevkariya desthilatên herêmê tora xwe ya fihûşê û ajanan li Başûr zêde dike û hewl dide bi rêya van şîrket û fîrmayan her wiha qaçaxçîtiyê li civakê belav bike.

**Îran û rojhilatê Kurdistanê**

Li gorî agahiyan, Îran di bazirganiya hişbirê de yek ji girîngtirîn welatên transît e. Hişbirên wekî metanfetamînê ji Îranê derbasî Tirkiyeyê dikin û ji bo veguhastina afyonê ber bi rojava ve jî, cihekî navendî ye. Li gorî rapora Neteweyên Yekbûyî ya sala 2021'an, ji sedî 90'ê benîştê afyonê yê li gelemperiya cîhanê hatiye desteserkirin, li Îranê hate girtin. Welatê ku salane herî zêde eroîn lê tê girtin Îran e (25 ton) û yê duyemîn jî Tirkiye ye (20 ton).
Li gorî îstatîstîkên fermî yên sala 2020'an ji aliyê dewleta Îranê ve hatin ragihandin, li Îran û rojhilatê Kurdistanê 2 milyon 800 hezar kes madeyên hişbir bikar tînin û tê texmînkirin ku zêdetirî milyonek û 400 hezar mirov jî tiryakî ne. Li gorî daneyên hatine aşkerakirin, li Îranê ji sedî 3,4'ê nifûsê bikarhênerên madeyên hişbirê ne û 64 hezar kes jî di asta jor de tiryakî ne. Hişbir li kuçeyan pir bi rehetî tê bidestxistin, bi erzanî û bi rengekî ku bi hêsanî bikaribin xwe bigihînin ciwanan, tê firotin.

**Sûriye û Rojavayê Kurdistanê**

Li Sûriyeyê ku gelek hêzên herêmî û navneteweyî mudaxaleyî 'Bihara Gelan' kir û bû hedefa şerên qirêj, hilberandin û bikaranîna madeyên hişbir hema hema li her derê belav bûye. Li gorî çavkaniyên pêbawer, hilberadina hişbirê û trafîka li herêmên di bin kontrola hikumeta Şamê de gelekî zêde bûye û di heman demê de ji sedî 70'ê aboriyê bi madeyên hişbir û şofandina pereyan (pak kirina pereyên reş) tê meşandin. Hin şîrketên dermanan veguherîne kargehên madeyên hişbir û tevî 15 kargehên mezin, zêdetirî 60 cihên hilberandinê hene. Piraniya cihên hilberandinê li nêzî deriyên sînor, bendera Latkiyeyê û herêmên qaçaxçîtiyê ne. Hebên ku têne hilberandin bi rêya tor û korîdorên ku hatine avakirin, ji bazarên hundirîn û derve re tên şandin. Tê gotin ku hişbir bi gelemperî ji Tertûs, Banyas û Latiqiyeyê, ji wir bi rêya deryayê ber bi Urdun û welatên Kendavê ve, bi rêya bejahî jî ber bi Urdun, Lubnan û Iraqê ve tê veguhastin. Tê gotin ku leşkerên hikumeta Şamê ewlekariya derbasbûnê dikin. Bajarê Hûmus ji ber cihê xwe yê erdnîgarî di bazirganiya madeyên hişbir de girîng e û bi rêya Lubnanê wek dergehê vedibe welatên Ereban tê bikaranîn.
Pisporê Ofîsa Madeyên Hişbir û Sûcan a Neteweyên Yekbûyî (UNODC) Thomas Pietschmann di 25'ê cotmeha 2021'an de ji rojnameya The National a Îmaratê re axivî û diyar kir ku Lubnan û Sûriye di salên dawî de bûne hilberînerên herî mezin ê captagonê yên herêmê.

**Tora hişbiriyê ya li Efrînê û dewleta tirk a çete**

Dewleta Tirk ji sala 2016'an ve beşeke xaka Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê dagir kiriye û tora xwe ya hişbirê li vir jî ava kir. Di dema avakirina baregehên leşkerî li Efrînê de di sala 2018'an de kargeheke ku madeyên hişbirê lê dihatin çêkirin li gundê Qîbarê yê Êzidiyan ava kir. Li gorî hin çavkaniyên pêbawer, li fabrîqeya hişbirê hin hebên hişbirê yên wekî captagon tên hilberandin. Heman çavkaniyan diyar kir ku kargeh aîdî zavayê Erdogan Berat Albayrak e. **ANHA**



## Kujerên bi hezaran kurdan çi bê şermin

Hafiz Ahmed

Ecêba giran bi destê neyarênme me, di nav Milletê mede tê gerandin. Henekî ji Kurdên ku jixwer dibêjin em Kurdperwerin û em dewleta Kurdî dixwazin, axeftin û nivîsandinên ecêb û sosret dikin. Ev axeftin û şîrove wek sosretekî ecêb liser medya civakî hênjî tên berdewam kirin. Gelo ev nêzikbun dinav milletekî ku tekoşîna azadiyê dide werin kirin, dê çawa werin pêşwazî kirin? Desthelata kû Kurd kuştine û dikujin, bi hijmara kuştina Kurdan eşkere pesnê xwe didin û binavê desthelatdariyê henekî duvkurdan dikine Vezîr, kesên qaşo dewleta Kurdî dixwazin, bi van vezîrên duvkurd, Kurd kujer û qirker wek destkeftên Kurd pênase dikin kêne? Bi Vezîrbuna van duvkurdan kîjan mêjî û dil, kijan exlaq û pîvan, xwe ser navê Kurd û Kurdîstanê serkeftî pênase bike? Gelo ev sosret li cem Filistîniyan an jî, li cem milletekî din were kirin, wê çi biqewime? Kesên milbimil li cem kujerên milletê xwe cîh bigre, sererd û binerdê welatê xwe bide talan kirin û bixwejî tevlî vê talanê bibe, divê çawa were pêşwazî kirin? Kesê licem kujerê milletê xwe û dagirkerê welatê xwe cîh bigre li cîhana Mirovahiyê çawa tê pêşwazî kirin? Milletê ku tekoşîna azadiya xwe dide, bivan sosretanre rubiru bimîne, gelo çawa bertekan nîşan dide? Kesê van nivîsan dinivîsin û van şiroveyan dikin Dibêjin: Mehmet Şîmşek, Hakan Fîdan û Cewdet Yilmaz bune payebilindê dewleta dagirker, ev jbo Kurdan destkefte! Gelo va ecêba di dîroka mirovahiyêde hebuye? Ger henekî karibin binavê Kurd û Kurdîstanê van hişmendiyan binivîsin û şîrove bikin û bi tundî neyine ruswa kirin, ev Civak wê kengî û çawa bigîhîje azadî û serxwebuna xwe? Gelo Piştî van guftugoyan kesên kû licem dujminê milletê xwe cîh girtin, bi çek û fermanên dagirkerên Welatê me, gellekî Alim û seydayên mejî di navde, 17 hezar Kurdê sivîl û bêguneh kuştin û neha têne sipî kirin, kîjan wîjdan û exlaq kare vê rureşîyê bipejirîne? Qatil û kujerên vê milletî wek HUDAPAR kû jêre tê gotin Qontra bi kîjan exlaqî behsa Kurdan dike? Heta qirikê dinav xwîna Kurdande digevizin û neha henekî dibêjin evjî Partiyekî Kurde. Ev çi sosrete, evçi karesate û evçi bêheşiyekû dinava civaka mede, binezanî anjî bizanatî tê guftugo kirin! Bivan nîqaşan dixwazin qatil û kujerên me, bime şêrîn bikin. Divê tu Kurdekî dinava van leystikên gemarde cîh negre. Divê tu bawermendekî paqij, van kujerên Seyda û alimên me û 17 hezar miirovên bê guneh jirêzê nebîne. Divê Milletê Kurd xwîna Şehîd û cangoriyên Welatê xwe, liser zimanê van qatilan nebihîze û nepejirîne.
Ev nîqaş gellekî xeteriyan di Pîvanên welatparêziyêde pêş dixe. Divê tu caran kujerên milletê me, nikaribin bivê rengî nîqaşan liser xak, ziman û gelê me bikin.
Raste kêmasiyên me hene, lê divê gelê me tu caran deriyan livan hişmendiyan veneke.
Em wek gelê Kurd gellekî nêzikê azadiyêne, dagirkerên me jî ji hêz ketine û sedsala lozanêde dewleta Kemalîst dê bi hemu rengên xwe têkbiçe.
Neha jibo Lozanekî teze, plana HÛDAPAR û van Vezîran di rojevêdeye, lê divê were zanîn ku dê gelê Kurd serbikeve.



# 'Tifaqa bi Kurdan re wê serweriya xaka Sûriyê biparêz e'

Hiqûqnas û şîrovekarê siyasî Hisên Naso anî ziman ku piştî hilbijartinên Tirkiyeyê dê çavnebariyên dewleta Tirk li Sûriyeyê zêdetir bibin. Naso bang li hikumeta Şamê kir ku ji bo rêgirtina li ber planên dewleta Tirk û rizgarkirina herêmên dagirkirî tifaqê bi Kurdan re bike.

**Navenda nûçeyan**

Ji ber mijulbûna dewleta Tirk bi hilbijartinên serokkomariyê û yên parlamentoyê, dosyaya nêzîkbûna ji Şamê re hat paşguhkirin. Lê piştî serketina Erdogan di hilbijartinên serokkomariyê de pirsên wekî gelo wê Erdogan hewldanên xwe yên nêzîkbûna ji Şamê re dewam bike an jî dosyaya nêzîkbûnê wekî kaxezeke zextê li dijî hevrikên xwe di hilbijartinan de bi kar dianî? xwe didin der
Hiqûqnas û şîrovekarê siyasî yê ji Sûriyeyê Hisên Naso got: "Li gorî nêrîna min, dosyaya mûzakereyên Tirkiye-Sûriyeyê dê ji rewşa beriya hilbijartinên Tirkiyeyê zehmetir bibe û dê helwesta Tirkiyeyê ji ya beriya hilbijartinan hişktir bibe, sedema vê yekê ew e ku dosyaya dan û standinên bi Sûriyeyê re yek ji kaxezên hilbijartinan bû. Dîsa dosyaya vegerandina penaberan hebû ku AKP'ê ji bo razîkirina civaka Tirk bi kar dianî û pê dilîst."
Hisên Naso diyar kir ku ji Sûriyeyê



bêtir pêwîstiya Tirkiyeyê bi diyalogan hebû û got: "Lê piştî serketina Erdogan texmîn dikim ku wê şertên Tirkiyeyê zehmetir bibin û wê rejîma Sûriyeyê nikaribe pêk bîne, di encamê de wê diyalog li cihê xwe bibmîne."
Civîneke din a çaralî
Rojnameya El Weten a nêzî hikumeta Şamê li ser zimanê çavkaniyên ji Moskovê ragihand ku civîna 'Komîteya Çaralî' dê vê mehê li ser asta cîgirên wezîrên karên derve yên Şam, Rûsya, Îran û Tirkiyeyê were lidarxistin. Her wiha destnîşan kir ku civîna çaralî dê hemwextî civîna Astanayê ku tê payîn di 21'ê Hezîranê de pêk pê, li dar bikeve.
Heman çavkaniyan diyar kir ku çîgirê werzîrê karên derve yê hikumeta Şamê Eymen Sosan jî dê beşdarî civînê bibe.
Kanala El Meyadîn a nêzî Hizbullah a Lubnanê jî li ser zimanê gerînendeyê dosyaya Sûriyeyê yê girêdayî Wezareta Karên Derve ya Tirkiyeyê got: "Diyaloga bi Şamê re di çarçoveya hevdîtina çaralî ya li Moskovê de pêk tê. Dê ev diyalog ji bo gihîştina çareseriyê li Sûriyeyê, çarenûsî be."
Li ser vê mijarê hiqûqnas Naso anî ziman ku civîna çaralî ya di navbera Tirkiye, Sûriye, Rûsya û Îranê dê di astên cuda de dewam bikin û wiha domand: "Lê bawer nakim ku ev civîn bighêjin asta hevdîtinên nêzîk di navbera Esed û Erdogan de. Hevdîtin dê di çarçoveya nîqaşkirina tedbîrên ewlehiyê û çawaniya têkbirina Rêveberiya Xweser de sînordar bimînin, lê nakevin nava mijarên siyasî û serdestiyê."

**Enqere dev ji çavnebariyên xwe bernade, çi ji şamê tê xwestin?**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo çareserkirina aloziya Sûriyeyê bi rêya diyalogên navxweyî beyannameyek ragihand. Lê hikumeta Şamê heta niha tu helwest nîşanî vê beyannameyê nedaye, ji wê zêdetir nêzîkbûna ji dewleta Tirk a ku xaka Sûriyeyê dagir kiriye, di ser nêzîkbûna ji Rêveberiya Xweser re tercîh dike.
Hisên Naso ji ber siyasetên dewleta Tirk hişyarî da û got: "Tirkiye ya Erdoganî dê dev ji daxwaz û çavnebariyên xwe bernede, dibe ku çavnebariyên wê piştî hilbijartinan zêdetir dibin. Dibe ku gelek sedem û egerên hundirîn û derve li pêşiya planên Tirkiyê yên berferhbûnê dibûn asteng, lê niha tune bin. Li beramberî wê Sûriyê helwesta xwe li hemberî Tirkiyeyê ya ku xaka wê dagir kiriye, xurt nekiriye, lê di vegera li Komkara Ereban tenê de helwesteke biçûk nîşan da. Hêza helwesta Sûriyeyê di helewsta erebî ya yekbûyî de ye ku piştgiriyê dide vegerandina xaka Sûriyeyê ya dagirkerkirî û tîfaqa bi Kurdan re ya ji bo dîtina formeke diyar ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdî. Bêyî tifaqa bi Kurdan re wê helwesta Sûriyeyê ya bi Tirkiyeyê re lawaz be, nemaze ku di dan û standinên bi Kurdan re ya di aliyê leşkerî de tu alternatîfên din li gel rejîma Sûriyeyê tune ye."
Hisên Naso di dawiya axaftina xwe de bang li hikumeta Şamê kir ku bi lez nêzî dewletên erebî bibe û hin daxwazên wê bi cih bîne û got, eger hikumeta Şamê bixwaze deverên dagirkirî ji destê dewleta Tirk derxîne û herêmên xwe ji terora ku desteka xwe ji dewleta Tirk digire, paqij bike divê bi Kurdan re tifaqê bike."

# Komîteya Şilêr sûcên li dijî zarokan şermezar kirin

**Komîteya Şilêr a Şopandina Mafên Zarokan, qetilkirina zarokekî li Geverê bi destê leşkerekî dewleta Tirk a dagirker û sûcê li dijî zarokan ê li Parîsê ji aliyê kesekî sûriyeyî ve, şermezar kirin.**




Komîteya Şilêr a Şopandina Mafên Zarokan têkildarî sûcên li dijî zarokan daxuyaniyeke nivîskî da.
Di daxuyaniyê de îşaret bi qetilkirina zarokê bi navê Erdem Aşkan (5) ê li navçeya Gever a Culemêrgê hate kirin û hate gotin: "Zarokê bi navê Erdem Aşkan bû qurbaniyê wesayîtên zirxî yên dewleta Tirk a dagirker û bi hovane hat qetilkirin. Kujer piştî lêpirsînê hat berdan. Heta ku ev kujer li derve bin gelek zarokên din jî dê bibin hedefa êrişan."
Her wiha li ser bûyera hedefegirtina zarokan li parkeke li Parîsê bi destê kesekî sûriyeyî jî hate gotin: "Zilamekî 31 salî û bi eslê xwe ji Sûriyeyê, êrişî parka ku zarokan lê dilîst, kir û di encamê de 4 zarok birîndar bûn. Jiyana wan di xetereyê de ye. Li ber çavan xuya dike ku ev kes di bin bandora dermanên hişbir de ye, ji ber ku kesekî bi vî awayî êrişî zarokan dike, ne kesekî normal e."
Di dawiya daxuyaniyê de hate gotin: "Em van êrişan şermezar dikin. Kesên ku parastina mafên zarokan dikin, divê li hemberî van êrişên hovane bê deng nemînin û bibin xwedî helwest."

# Desteya Çandê banga parastina şûnwaran kir

**Desteya Çandê ya Rêveberiya Xweser deverên şûnwarî tamîr dike û ji bo parastina wan bang li şêniyan dike.**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek cihên dîrokî û şûnwar hene. Desteya Çand û Hunerê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo parastina van cihan komîte ava kirine.




Cîgirê Hevserokatiya Desteya Çandê Zerdeşt Îsa têkildarî mijarê got: "Desteya Çandê ya Rêveberiya Xweser gelek komîte ava kirin. Mîsyona van komîteyan; deverên dîrokî biparêzin,



wan arşîv bikin û rê li ber binpêkirinên li dijî şûnwaran bigirin."
Îsa destnîşan kir ku ji bo parastina şûnwaran parêzvan û çavdêr hene û wiha domand: "Piştî ku cihên şûnwarî hatin tespîtkirin, raporeke der heqê wan de hat amadekirin. Di raporê de binpêkirinên ku komên çeteyan li dijî şûnwaran kirine, hatin parvekirin."
Îsa bi bîr xist ku dema çeteyên DAIŞ'ê û komên terorîst herêm dagir kiribû, şûnwar talan dikirin û dikolan, lê niha binpêkirin hema bêje nemaye.
Zeredeşt Îsa diyar kir ku Desteya Çandê çavdêriya deverên şûnwarî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wekî Girê Mozan, Til Beyder, Keleha Caber, Sûra Reqayê, Keleha Necim dike.
Îsa bang li şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir ku mîrateya çanda herêmê biparêzin û got: "Deverên dîrokî ne milkê kesekî yan herêmekê ne, lê milkê tevahî gelên herêmê ne. Ji ber vê yekê divê ev cih werin parastin."
Desteya Çandê, semîneran li ser girîngiya parastina cihên dîrokî dide şêniyan.

# Li Başûrê Kurdistanê baregihên nû yên dagirkerên tirk

**Dewleta Tirk a dagirker di avakirina baregehên xwe yên leşkerî yên di nava xaka Başûrê Kurdistanê de berdewam e. Hat ragihandin ku tenê li derdora bajaroka Şêladizê ya ser bi Amêdiyê artêşa Tirk 10 baregehên leşkerî avakiriye. Her wiha ji ber zext û êrişên artêşa Tirk a li deverê, bi hezaran malbat ji gundan koçî Dihok û bajarokên girêdayî wê bûne.**

Rojnameya Hawlatî di raportek xwe de îşaret bi hebûna baregehên leşkerî yên



dewleta Tirk ên li herêma Behdînanê kir. Di raportê de hatiye diyarkirin ku artêşa Tirk li nava xaka Başûrê Kurdistanê bi sedan gund û herêman dagirkiriye. Her wiha li hinek bajarok û gundên sinorê Dihokê hatûçon qedexe kirine.
Di raporta rojnameyê de hatiye gotin ku bajaroka Şêladizê ya ku 30 kîlometran ji navçeya Amêdiyê ya ser bi Dihokê dûre, ji ber êrişên dewleta Tirk, piraniya gundên wê vala bûne.
Li gorî agahiyên ku Rêveberê Şêladizê Rizgar Ubêd dane rojnameyê, ji ber êrişên berdewam ên dewleta Tirk a dagirker, 85 gundên dikevin nava sinorê bajaroka Şêladizê vale bûne. Rizgar Ubêd diyarkiriye ku di wan gundan de jiyan bi temamî nemaye, her wiha qedexeya hatûçûna wan gundan hatiye ragihandin û ji xelkê deverê re hatiye gotin ku nabe kes serdana wan gundan bike.
Welatiyê bi navê Nayif Sîteyî yê ji komelgeha Sîrê ya ser bi Şêladizê ye, gotiye ku gundên hatine valekirin, wek kampan lêhatine, derdora wan hemû hatine girtin û welatî nikarin bi rehetî hatûçonê bikin.
Mamostayê Zanîngehê û xelkê komelgeha Sîrê Dilşad Nesrullah jî li ser mijarê agahî dane rojnameyê û gotiye; "Niha artêşa Tirk nêzî 10 baregehên leşkerî li ser çiya û girên derdora Şêladizê avakiriye. Ev baregeh dikevin devera Mam Reşa, Kêrya Dêrê, Serê Darê û Kelha Bêde. Her wiha artêşa Tirkiyê hêzek zêde li herêmê bi cih kiriye."
Dilşad Nesrullah diyarkiriye ku gundên vala bûne, her yek ji wan herî kêm 50 ta 75 malbat têde hebûn. Ji ber metirsiya êrişan koçî navenda Şêladizê, Dêrelok, Sersing, Qediş, Amêdî û Dihokê bûne.

# Mexmûr sembola berxwedanê ye

Rêwitiya wan ya ber bi Başûrê Kurdistanê ve, ne ji bo serî tewandinê bû. Ew li pey doza rewa ya gelê Kurd bûn, dema koçkirin dizanîn ku ewê ber bi rêwîtiyek dûr û dirêj biçin, 30 salin penaberên Mexmûrê, li hemberî zilm, zordarî, êriş, birçîbûn, tênbûn, germahî, toz û xiyanetê di nava berxwedanê dene. Ew êdî bûne sembola berxwedana Gelê Kurd. Berxwedana 16 rojî, bû ispata berxwedana 30 salan ya penaberên Mexmûrê.

Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) li quntara çiyayê Qereçox a di nava sînorên navçeya Mexmûr a girêdayî parêzgeha Musilê de ye. Pêla mezin a koçberiyê sala 1994'ê pêk hat. Li wargehê nêzî 12 hezar welatiyên ji Bakurê Kurdistanê ku di sala 1994'an de ji ber zilm û zordariya dewleta Tirk neçar mane derbasî Başûrê Kurdistanê bibin, dijîn. Li ser Wargeha Mexmûr li gel êrişên dewleta Tirk a dagirker, 4 salin rêgiriyek ji aliyê PDK'ê ve tê meşandin.
Dii sala 1994'ê koçberiya ji ber zilma dewleta Tirk despêkir hat û beşek ji welatiyan li bejahiya navçeya Zaxo ya girêdayî Duhokê bi cih bûn, beşek jî, li Şeraniş û Bihêrê yên girêdayî herêma Heftanînê bi cih bûn. Li vê herêmê welatî nêzî 2 mehan man.
Pitşî wê di sala 1995'an penaber li herêma Etrûş hatin bicihkirin. Di heman salê de beşek welatî li Geliyê Qiyametê jî hatin bicihkirin. Di sala 1995'an de PDK'ê ambargo danî li ser wargehan û nehişt ku tiştên jiyanî derbasî wargehan bibin. Her wiha hatin û çûyîn qedexe kir. Di heman salê de hêzên girêdayî PDK'ê bi destek û daxwaza dewleta Tirk êrişî her du wargehan kirin.
Sala 1997'an ji ber planên Tirk ên dagirker li dijî Tevgera Azadiya Kurd û dîsa hevkariya PDK'ê ya li gel dewleta Tirk penaber li herêma Nînova bi cih bûn. Li ser dijwarbûna êrişan heman salê gel derbasî wargeha Nehdaran bû. Piştî du mehên dijwar ên jiyan û êrişên dewleta Tirk û PDK'ê gel ji vir jî koç kirin.



### Mexmûr

Şêniyên wargehê piştî rêyek gelek dirêj a tije êriş, zehmetî û êşên jiyanê, li Mexmûrê bicih bûne. Ji sala 1994'an ve bi rêzê li wargehên Bihêrê, Şeraniş, Bêrsîvê, Geliyê Qiyametê, Etrûş, Nînova û Nehdaran mane. Di van wargehan de ji bilî êşên mezin ên jiyanê ku gelek zarok, pîr jinan jiyana xwe ji dest dan, panaber bi gelek êrişan re jî rû bi rû man. Di van êrişan de jî gelek welatî hatin qetilkirin. Her wiha li wargehên Etruş, Geliyê Qiyametê û Nînovayê bi ambargoyan re rû bi rû man.
Koçberên Bakur di encama van rêwitiyên zor û zehmet de di sala 1998'an de li quntara çiyayê Qereçox a navçeya Mexmûrê ya ser bi Musilê bicîh bûn. Di salên destpêkê de zehmetiyên gelekî dijwar dîtin û ava vexwarin û paqijiyê jî, bi zehmetî peyda kirin. Her wiha cihekî ku xwe bispêrin nebû û tenê ji ber dupişkan bi dehan kesan jiyana xwe ji dest da.
Tevî hemû zor û zehmetiyan jî, gelê koçber li vir jiyanek nû afirand, mal hatin çêkirin, saziyên rêveberî, belediye, perwerde, tenduristî, parastin û hwd. Hatin avakirin. Di heman salê de (1998) ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) bi awayekî fermî wekî wargeha penaberan hat qebûlkirin.

### Parastina Hewlêrê!

Di dema êrişên çeteyên DAIŞ'ê yên ser Suriye û Iraqê de li Wargeha Penaberan a Mexmûrê, beramberî êrişek muthemel tedbîr hatin girtin. Di çarçoveya van tedbîran de Şêniyên wargehê ji aliyê Hêzên Parastina Wargehê ve ji wargehê hatin derxistin. Di 7'ê Tebaxê de jî çeteyan êrişî wargehê kirin. Li ser vê yekê Hêzên Parastina Wargehê û gerîlayên HPG'ê ku piştî êrişa li ser Şengalê ji bo parastinê hatibûn herêmê, berxwedanek mezin nîşan dan. Di encama berxwedana 3 rojan de, wargeh di 10'ê Tebaxê de ji çeteyan hat paqijkirin. Bi vî rengî cara yekemîn çeteyên DAIŞ'ê hatin têkbirin û xofa wan hat şikandin. Her wiha navçeya Mexmûrê hat rizgarkirin. Di wê demê de pêşmerge jî tevlî vê berxwedanê bûn. Bi vî rengî metirsiya li ser Hewlêrê jî rabû. Serokê wê demê yê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî çûbû Mexmûrê û spasiya gerîlaya û xelkê wargehê yên ku DAIŞ'ê şikandin, kiribû. Lê rêveberiya Barzanî vê yekê nedît û piştî sala 2014'an dest bi planên nû li ser wargehê kir.

### Bersiva PDK'ê bû ambargo!

Rêveberiya PDK'ê di 17'ê Tîrmeha 2019'an de ambargo danî ser wargehê û rê neda ku tu kes ji wargehê biçe Hewlêrê. Ji ber rêgiriyê, bi dehan nexweşên rewşa wan giran e, nekarîn biçin Hewlêrê. Rojek piştî wê ango di 18'ê Tîrmeha 2019'an de balafirên şer ên artêşa dewleta Tirk, wargeh bombebaran kir. Di encama bombebaranê de 2 şêniyên wargehê birîndar bûn. Piştî dewleta Tirk û PDK'ê rê li xelkê Mexmûrê girt, kete nava hewldanên wargeh valekirinê. Bi gelek rêyên cûr be cûr xwestin wargehê vale bikin û îradeya xelkê wargehê bişkînin. Lê xelkê Mexmûrê bi berxwedanek xurt li ber xwe da û heya roja îro dijî plan û komployên PDK'ê û dewleta Tirk li ber xwe dide.

### Yekem hewldana têlkirinê

Di 27'ê Kanuna 2021'an de Hêzên Iraqê ji nişka ve serê siharê xwestin bikevin wargeha penaberan ya Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr). Hêzên Iraqê xwestin derdora hemû wargehê têl bikin û bixin dorpêçê. Lê xelkê Mexmûrê hemberî vê rawestiya û nehêlan Iraq derdora wargehê têl bike.

### Carek din hewla têlkirinê

Di 20'ê Gulana 2023'yan de carek din leşkerên Iraqê hewl dan bikevin wargehê û li derdora wargehê xendekan bikolin, têl bikin û bircan danin. Xelkê ku bi berxwedana xwe tê nasîn, carek din rabû ser xwe û li ber hewldanên dorpêçê rawestiyan.

### 16 rojên berxwedanê

Di 20'ê Gulanê hêzek li ser navê Artêşa Iraqê bi wesayîtên zirxî, polîs, leşkerên taybet, wesayîtên kar berê xwe dan wargeha penaberan. Hêza leşkerî bê ku guh bide xelkê Mexmûrê xwest bikeve nava wargehê û derdorê têl bike. Lê hêza berê xwe dayî Mexmûrê, çîroka gelê berxwedê nexwendibû, nedizanî xelkê Mexmûrê 30 salin li dijî êriş, dorpêç, xiyanet û zilmê li ber xwe didin.
Jin, zarok, kal û pîr, bihezaran şêniyên wargehê danê siharê berê xwe dan seytereyê û rê li hêza ser bi Artêşa Iraqê girt. Dema çavên leşkeran bi girseya gel ket, matmayî man. Lê leşker li bendê bun ku dema ew bikevin nava liv û tevgerê, ewê ti berxwedanek nebînin. Leşkeran bi wesayîtên zirxî ketin nava liv û tevgerê û xwestin li dora wargehê, xendekan bikolin, bircan danin û têl bikin.
Girseya gel yekser xwe li wesayîtan kir mertal û nehêlan leşker bi pêş de biçin. Bi vê re leşkerên Iraqê xwestin çavê welatiyan bitirsîne û gule bi ser xelkê de barandin. Dema girseya gel vê helwesta Iraqê dîtin, bi hêrs bûn û bi keviran bersiva leşkerên Iraqê dan. Leşkerên ku ne li benda vê berxwedanê bûn, neçarman gavek bi paşde biçin û rawestin.
Di 20'ê Gulanê de, leşkeran vê carê raste rast gule berda xelkê wargehê, di encama êrişê de ciwanek birîndar bû. Vê carê xelkê wargehê bi hêrstir bû. Dema hêza Iraqê hêrsa gel dît, neçarma serî li rêyên diyalogê bide. Şandeya ji rayedarên Iraq û Neteweyên Yekbûyî pêkdihat, bi nûnerên xelkê wargehê re civiyan. Lê Iraq di ya xwe de bi israr bû, lewma guh neda daxwazên xelkê wargehê û ew civîn bê encam ma. Ji xwe piştî bi salan cara yekem bû nûnerên Neteweyên Yekbûyî jî serdana Mexmûrê kiribûn.

### Helwesta NY

Wargeha Mexmûr ku dibin sîwana Neteweyên Yekbûyî deye, tevî hemû êrişan jî deng ji Neteweyên Yekbûyî dernakeve. NY di salên dawî de ti alîkariyek raber nake û dijî hemû êrişên ser Mexmûrê bêdengiya xwe diparêz e.
Bê helwestiya Neteweyên Yekbûyî, bêdengiya desthilata Herêma Kurdistanê, moralê xelkê wargehê nexist û gav bi paşde ne avêtin. Xelkê wargehê diyarkirin ku ew bi xwe parastina xwe nekin, xwedî li xwe dernekevin, wê kes xwedî li wan dernakeve. Ji bo wê gelek hevdîtinan ku bê encam man, biryara dewamkirina berxwedanê dan.
Ji 20'ê Gulanê ve hêzên Iraqê her siharê û êvarî diketin nava liv û tevgerê, lê her carê berxwedana xelkê wargehê didîtin. Hêzên Iraqê rê li çûn û hatinê girtin, xwestin embara avê bigrin û avê jî li ser xelkê wargehê bigre. Lê xelkê wargehê rêneda û dijî vê di konên berxwedanê de li ber xwe dan. Berxwedana Mexmûrê, li her çar parçeyên Kurdistan û dervey welat bû sedem ku Kurd dakevin kolanan. Hema bêje ji her derê piştgiriya ji Mexmûrê hat ragihandin. Her wiha bi dehan saziyan jî bi daxuyanî û çalakiyan piştgirî dan berxwedanê.

### Berxwedana Mexmûrê bi serket

Meclisa Gel a wargeha Mexmûrê girêdayî hewildanên dorpêçkirina wargehê got; "Ev 16 rojin gelê me li dijî dorpêça Iraqê li ber xwe didin. Ev hewildana dorpêçkirina wargehê ne niha ketiye rojeva me, ev du salin di rojeva me de ye. Ji ber ku di sala 2021'an de jî xwestin dora me têl bikin. Ev dorpêç bi zextên dewleta Tirk û hêzên herêmî wek Mala Barzan pêktên. Ev dorpêç parçeyek a konsepta dewleta Tirk e. Dewleta Tirk û PDK dixwazin wargeha Mexmûrê belav bikin. Ji ber wê jî zextek zêde li Iraqê dikin. Heta niha wek wargeh, me ti zagonên Iraqê binpênekirine. Iraq jî vê dizane. Me di hevdîtinên xwe de bi caran anî ziman ku bi xwestekên dewleta Tirk û PDK'ê tevnegerin û dora me dorpêç nekin. Di 20'ê Gulanê de xwestin dora me têlbikin û xendekan bikolin, bi seyareyên zirxî û bi çek dora wargehê girtin. Li ser vê yekê gelê me wek timî berxwedana xwe nîşanî Iraqê da. Me ji ber vê mijarê gelek hevdîtin pêkanîn û herî dawî hevdîtinek a me li Bexdayê çêbû. Di encama hevdîtinan de, bi rêya diyalogan li hevkirinek çêbû. Iraqê hêzên xwe yên zêde ku hatibûn dora wargehê dorpêçbikin, di paş de birin û me jî dawî li çalakiyên xwe yên demokratîk wek çalakiya konvedanê anîn.
Lê bila her kes bizane, kengî êrişek li ser wargehê çêbibe û bixwazin vîna gelê Mexmûrê desteser bikin, wê li hember xwe têkoşîn û berxwedana gelê wargehê bibînin. Em dizanin ev dorpêçkirin xwesteka dewleta Tirk û PDK'ê ne û dixwestin bi destê Iraqê bidin pêkanîn. Ji roja destpêkê heta niha me xwest bi diyalog ev mijar çareser bibe û wisa jî çêbû."
Li gorî daxuyaniya duh hatî dayîn, penaberên Mexmûrê çawa duh dijî hemû êrişan di nava berxwedanê de bûn, wê îro û sibe jî li dijî hemû gef, zext û êrişan xwedî sekna xwe ya bi rûmet bin.



# Guhartina Demografîk li Efrînê berdewam e

Kiryarên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê yên dijmirovî li Efrîn bênavber didom in. 5 salin ku dagirkerî bi tevahiya şêwazan guhartina demografîk li Efrînê dimeşîn e. Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan ya Efrîn, ji destpêka dagirkirina Efrînê ve, zêdetirî 25 kampên mîtîngeriyê hatine avakirin.

**Zana Roj/ Şehba**

Dewleta Tirk a dagirker di 20 Çileya 2018'an de, di encama pilangeriyeke navnetewî de, êrîşê herêma Efrîn kir, di êrîşan de tevahiya çekên giran bikar anî, di seatên destpêkê yê êrîşan de, dagirkeriyê bi 72 balafirên şer êrîşî herêma Efrînê kir. Dagirkeriya Tirk û çeteyên giryêdayî wê tavahî cûreyên binpêkirinên mafên mirovî û exlaqî pêk anîn.
Di berxwedana serdemê de gelê Efrînê û şervanên wê bi hemû hêza xwe li hember 2'yemîn hêza di NATO yê de şerekî efsanewî dan meşandin, bi stratejiya Şerê Gelê Şoreşgrî gelê Efrînê berxwedaniyeke dîrokî li hember qirkirinê û dagirkeriyê da meşandin. Tevî cografiya Efrîn ya biçûk jî, gel û şervanên azadiyê 58 rojan berxwedaniyeke ku di dîrokê de nehatiye dîtin kirin.
Di pêngava êrîşên dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê de bi 100'an şervan, sivîl û zarok şehîd û bi 1000'an jî birîndar bû, her wiha bi 10'an komkujî hatin pêkanîn. Piştî berxwedana 58 rojan, gelê Efrînê di 18'ê Adara 2018' an de koçberî herêma Şehbayê bûn. Gelê Efrînê li herêma Şehbayê careke din bi îradeyeke mezin qonaxa 2' yemîn berxwedana serdemê berdewam dikin.

### Kiryarên dagirkeriyê li Efrînê bê navber berdewamin

Bi dagirkirina Efrînê re bi 10 hezaran malbatên çeteyan derbasî herêmê bûn û li şûna gelê resen yê herêmê hatin bi cih kirin. Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê hemû cûreyên talankirin, qetilkirin, tecawîzkirin, mişextkirin, revandin û qutkirina daran û daristanan pêk tîne. Ev yek bi dirêjiya 5 salan heyanî roja îro jî bê navber berdewam e.

### Çarenûsa gelê resen ne diyar e

Dewleta Tirk û çeteyên li Efrînê gelê resen ji tavahî mafên wan yên rewa bêpar dihêle, di hemû aliyan de zordariyê li ser gel didin meşandin. Bi darê zorê zimanê Tirkî di dibistanan de didin xwendin, her wiha lîreya Tirkiyê di Efrînê de tê bikar anîn û nasnameyên Tirkî tên dayîn. Di heman demê de bê navber di serî de jin û hemwelatî tên revandin, destdirêjî li wan tê kirin û ji bo berdana wan fidye tê xwestin. Heyanî vê kêliyê jî çarenûsa bi hezaran jin û welatiyên di zindanan de ne diyar e.

### Zêdetirî 25 kampên mêtîngeriyê hatine avakirin

Dagirkeriya Tirkiyê bi pilanên xwe yên qirker, armanca guhartina demografîk a Efrînê dike. Ji 5 salan ve guhartina demigrafîk û etnîkî tê meşndin û bi 10'an kampên mêtîngeriyê dane avakirin. Li gorî rêxistina mafên mirovan a Efrîn-Sûriye ji destpêka dagirkeriyê de zêdetirî 25 kampên mêtîngeriyê hatine avakirin. Hêjayî gotinê ye ku ev kampên mitîngeriyê, bi destekdayîna



rêxistin û saziyên Qeterî û Kiwêtî hatine avakirin, her wiha di vê dawiyê de hin rêxistin û kombûnên Filestînî jî destekê didin dewleta Tirk a dagirker.

### Kiryarên dagirkeriyê di sala 2023'an de

Sûcên dagirkeriya Tirkiyê li ser gelê resen berdewam in, û her ku diçe zêdetir dibe. Li gorî rêxistina mafên mirovan di 2023'an de 10 hemwelatiyên Efrînê hatine Kûştin. Her wiha 150 hemwelatî hatine revandin ji wan jî, 19 jin in.

### Di 6 mehan de 13 hezar dar hatin qutkirin

Ji 5 salan ve zêdetirî 36 hezar dar li Efrînê bi destê çeteyan hatine qutkirin. Di sala 2023 an de li gorî bîlancoya 6 mehan zêdetirî 13 hezar dar hatine qutkirin û zêdetirî 1000 darî jî hatine rakirin.
Her wiha kiryarên dagirkeriyê yên li ser cihên dîrokî û talankirina dîroka herêmê bi armanca derxistina berhemên binerd nehatine sekinandin. Tenê Di 2023 an zêdetirî 5 cihên dîrokî di Efrênê de hatine talankirin.

### Avakirina Kampên mêtîngeriyê

Armanca dagirkeriyê ya sereke, ew e ku siyaseta qirkirinê ya li ser gelê Kurd dewam bike û guhartina demografîk pêk bîne, li ser wê bingehê dewleta Tirk a dagirker ji destpêka dagirkirina Efînê ve, bi tûndî siyaseta xwe li ser gel dide ferzkirin. Di Efrînê de ji bo guhartina demografîk bi destê rêxistinên dewletên ereban yên weke Kiwêt û Qatar bi 10'an kampên mêtîngeriyê avakirin û ji aliyê navnetewî de tu helwestên nerezaîbûnê nehatine nîşandan. Hêzên navneteweyî ji bo berjewendiyên xwe, bêdeng dimînin û destekê didin dewleta Tirk a dagirker.
Li gorî rêxistina mafê mirovan ji destpêka dagirkirinê ve, dagirkeriya Tirk dest bi avakirina kampên mêtîngeriyê kiriye û zêdetirî 25 kampên mêtîngeriyê li tavahî navçeyan hatine çêkirin.

### Kampên mêtîngeriyê li Efrîn bê navber têne avakirin.

Di Çileya 2023' an de, li navçeya Cindirêsê kampên mêtîngeriyê yê bi nave (Ecnedîn Filastîn) ji aliyê rêxistineke Filastînî ve hatiye avakirin. Di Sibata 2023'an de, li navçeya Şiyê ji aliyê komeleya Şam El Xeyrî ve gundek hatiye avakirin bi navê Qeriyê El Qatariyê 2. Her wiha li gundê Qere Tepe ya girêdayî navenda Efrînê ji aliyê saziya El Rîsalê ve 170 yekêne hatine danîn. Di Adara 2023'an de, li gundê Hêkçê ya navçeya Şiyê ji aliyê komeleya Qatarî kampên mitîngeriyê tên amedekirin. Li gundê Ereb Şêxo yê navçeya Mabeta Mizgeft hatiye avakirin. li gunê Sindiyankê yê navçeya Cindirêsê ji aliyê komeleya Qatarî ve 50 yekîne hatine danîn.
Di Nîsana 2023'an de, li navçeya Cindirêsê ji aliyê Sindoqa geşepêdanê ya Qatar ve kampên mitîngeriyê ji bo bicihkirina tirkmen û ereban hatiye avakirin.

# 'Hikumeta Îraqê û PDK'ê bi dagirkeriya Tirk re hevkarin'

**Reşo Qamişlo/Qamişlo**

**Hediya Şemo diyar kir ku hikumeta Îraqê û PDK'ê hevkarên dewleta Tirk a dagirker in û got"Civaka Êzîdî koka gelê Kurd e û divê tevahiya gelê kurd li berxwedana gelê Şengalê xwedî derkevin."**

Êrişên qirkirinê yên li dijî Êzîdiyan di herikîna dîrokê de birêkûpêk hatine kirin. Êrişa destpêkê ya herî berfireh ya tê zanîn, sala 906'an dest pê kir û fermana herî mezin ya dawî jî sala 2014'an bû.
Şeva 2yê Tebaxa 2014'an, çeteyên DAIŞ'ê dest bi êrişa ser Şingalê kirin. Li Sîba Şêx Xidir, Girzerik, Til Benat, Til Qeseb û Koço, bi hezaran mirovên Êzîdî hatin kuştin, bi hezaran dîl hatin girtin û revandin. Yên ji ber çeteyan reviyayîn neçar man berê xwe bidin çiyayê Şingalê.
Li gor serjimariya Rêveberiya Giştî ya Kar û Barên Êzîdiyan, derdora 1293 kesan di rojên destpêkê yên êrîşên çeteyan de, jiyana xwe ji dest dan. Herwiha zêdetirî 80 gorên komî jî hatine dîtin, bi hhezaran jin û zarok jî ji aliyê çeteyan ve hatin



e revandin.
Piştî rizgarkirina Şengal ji çeteyên DAIŞ'ê , herwiha damezrandina Rêveberiya Xweser û hêzên leşkerî yên Şengal, dewleta Tirk a dagirker û bi hevkariya PDK'ê û hikumeta Iraqê, rojane pêşengên berxwdana Şengal û gelê sivîl dike armanc. Ne tenê li Şengal, dagirkeriya Tirk êrîşên xwe yên ser Qadên Girêlayên azadiyê jî zêdetir kirine, armanca wê ya sereke qirkirina gelê Kurd e. Têkildarî êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser Şêngal û Qadên Berxwedanê yên Girêlayên Azadiya Kurdistanê hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) ya navçeya Tirbespiyê, Hediya Şemo, ji Rojnameya me "Ronahî" re axivî.

### 'PDK`ê û Hikumeta Iraqê bi dagirkeriya Tirk re hevkarin'

Hediya Şemo diyar kir ku PDK`ê û hikumeta Îraqê hevkariyê bi dagirkeriya Tirkiyeyê re dikin û wiha axivî: "Dewleta Tirk ya dagirker, di dema niha de, dixwaze xwena Impratoriya Osmanî ji nû ve pêk bîn e û tevahiya herêmê dagir bike. Ev dewleta dagirker ji destpêka salên 90'î ve heya niha êrîşî Qadên Berxwedanê yên Gerîlayên Azadiyê dike. Li hember vê yekê jî berxwedaniyeke mezin ji aliyê Gerîlayên Azadiyê ve tê kirin. Li Şengalê jî ji bo qirkirina gel gelek ferman pêk hatin. Di sala 2014'an de bi destê çeteyên DAIŞ'ê fermaneke nû li dijî gelê Şengalê hat kirin. Piştî wê bi saya berxwedana gel, DAIŞ têk çû û Şengal hat rizgar kirin. Piştî rizgarkirinaŞengalê dewleta Tirk bi destê xwe ev qirkirin berdewam kir û hîna jî êrîş li ser Şengalê tên kirin. Ev kiriyarên qirêj yên ku dewleta Tirk li van herêman dike, PDK`ê û hikumeta Îraqê jî bêdeng in û ev tê wateya ku destê wan jî di van kiriyaran de jî heye"

### 'Tu ferman nikarin vîna gelê Şengalê bişkîn e'

Hediya Şemo da zanîn ku tu ferman nikarin vîna gelê Şengalê bişîkîn e û wiha domand: "Bi 100'ê salan e ku ferman li dijî civaka Êzidî pêk tên, fermana dawiyê bi destê çeteyên DAIŞ'ê pêk hat, fermana 74'an bû. Me hemû ferman nedîtin, lê dîroka gelê Şengalê berxwedana gel ya li dijî fermanan vedibêje. Fermana dawiyê keserek di dilê gelê kurd û civaka Êzîdî de çand. Me dît ku hêzên PDK'ê û Hêzên Îraqê çawa jin û zarok di destê çeteyan de hiştin û van çeteyan jî hemû rengê binpêkirinê di derheqê wan de kirin. Ev ferman bi xwe pilana dewleta Tirik ya faşist bû. Herwiha fermana ku bi destê DAIŞ`ê û fermanên berya wê hatin kirin û hîn jî civaka Êzîdî tê hedefgitin, tev pilanên dewleta Tirkiyeyê ne, armanc jê qirkina civaka Êzîdî ye. Herwiha tevî van fermanan hîn jî civaka Şengalê hebûna xwe isbat dike û berxwedaniyeke bêhempa dide nîşandan. "

### 'Civaka Êzîdî koka gelê kurd e'

Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) ya navçeya Tirbespiyê, Hediya Şemo da zanîn ku civaka Êzîdî koka gelê kurd e , ji ber wê dibe armanca dagirkeran û axaftina wiha bi dawî kir: "Herdem dewleta Tirk ya qirker ji bo qirkirina civaka Êzîdî, êrîşî Şengalê dike, dixwazin di şexsê civaka Êzîdî de, gelê kurd qir biki. Ew dizanin ku civaka Êzîdî koka gelê kurd e. Em dizanin ku dewleta Tirk siyaseta xwe ya qirkirinê ya li dijî civaka Êzîdî ranawestîne, ji ber wê ji tevahiya gelê kurd li her çar perçeyên Kurdistan û li cîhanê tê xwestin ku xwedî li civaka Êzîdî derkevin û ji berxwedana gelê Şengalê re bibin pişgir."